..... Hozanyarî navbera Zerdeşt û Eristo :
ev regezê duwem berpirsyarê gunehan e, ji ber ku arîkariyeke babetî jê têye xwestin (**Xêr an Şer**) lê, di warê xuristiyê de, ev her du regez pir dûrî hev û din in, ji lewra regezê sêyemê, ku bi navê hêza hişmendiyê ye, tevî navbera **Xêr û Şerî** dinase û ew, ji layekî din ve, jêderê bîr û bawerî ye.

-2-

Zerdeşt berpirsiyarîke din sipart regezê sêyem (**hêza hişmendîyê**)
Ji ber ku jêderê bîr û bawerîyê ye, hêza hişmendiyê, divêye giyanê enzan ji gunehan rizgar bikê, û rakêşeke bê tixûb ji layê rastekînê ve di mêjûwê **Enzan** de biçîne.
Wehanî **Zerdeşt Enzan** berpirsiyar dibîne, ji ber ku divêye li angora vê berbareyê biçe **(Minş, Gofiş, Koniş)** ango (**Bawerî, Gotin, Kar**) .

-3-

Di pertûka xwe de (**çîrok Hozanyarîye**) - **Will Dîyûrant**- dibêje:
(**Birgîson**) gaveke pir nirxdar û giranbuha avêt, dema ku wazyatiya veguhertinê afirand.
Lê di baweriya min de, ev gotina ha ne dirust e,... ji ber ku
(**Birgîson**) binçiyê veguhertinê ne bi rengekî berî jiyanî vedistîne; ew, bi rastî li orteya **Zerdeşt** û **Eristo** radiweste. **Zerdeşt** bawerî bi dijberyatiyê tinê, **Eristo** dibêje: veguhartin di qalikan de dimîne, nagihe naveroka tiştan, ji lewra bunyad li nik wî rastekîn e, bê veguhartin **(Dar Dar e) (Enzan Enzan e) (Hesp Hesp e**), beramberî wana, - **Birgîson** - dibêje: veguhartin digihe qaqilê eyînî - tiştan - bunyadê, lê dijberyatî li nik wîna nagihe radeya wazyatîyeke hozanyarîyê.

-4-

Hozanyarê **Yûnanî (Totyanos)** bi navdarîya (**Zerdeşt, Bûda, Konfosyos**) bihîst; demeke dirêj bi Zerdeşt re maye, nemaze wazeya li ser regezên xuristê (**Ba, Ax, Ar, Av**).bawerîyê tînin.
Di ber vê yekê re (**Fîsazors**)
Hozanyarê **Yûnanî** yê mezin, bi pirciwanî li ser ramyarîya **Zerdeşt** rawestiya ye, û bawerî bi gelek ramanên wêna anîye.

-5-

Hozanyarê mezinî **Yûnanî (Platon**), tevî ku li ser **Zerdeşt** dibêje: (hişmendê herî giranbuha), dijberî hozanyarîya wîna radiweste û bingeha **dibistana Yûnanî** di hozanyarî û ramyarîyê de ava dike;
(**Platon**) dibêje: ku cîhana pelandî gomaneke mezin e, ji ber ku rastîya tiştan ne pelandî ye, lê wazeyîn e, dema ku merov tiştekî dibîne, ew wî tiştî bi xwe nabîne, lê wêneyê wî tiştî tê bîra wîna
û ev bîranîna ha ne ji têkelîya navbera merov û wî tiştî ye, na xêr, lê ew bîranîn di cîhana wazeyînê de û her weha, tu rastîya tiştekî hîç tune ye, merov ji wazeyînekê diçe wazeyîneke din.

-6-

Hozanyarê bilind yê **Elmanî (Nîştê)** xwe bi xurtî sipart ramyarîya **Zerdeşt**, nemaze wazeya wî ya pir navdar (**vîna jînê**).
Mixabin gelek Ramanvan, mîna (**Rojê Garodî, Abbas Mahmûd Al-A´kad,** û **Bakir Al-Seder**) ev babet bi çewtî rave kirine; ew goman dikin, ku (**Nistê**) dijberî **Zerdeşt e** û dixwaze enzan hemû li hev bicivin û bi arîkariya hêzên serî Xwedan bimrînin.
Ji ber ku **(Nîştê**) hozanyariya xwe li ser " **mirina Yezdan** " ava kiriye.
bawerîya min de, bêtar ne bi vî haweyî tê têgihiştin.
(**Nîştê**) bawerî bi du ramanên **Zerdeştî** tîne:
1- binçiyê dijberîtî ye.
2- Vîna jînê , ango vîna enzan e .
Zerdeşt xwe û **Enzan** di naveroka **Xwedanê Xêrê û Xwedanê Şerî** de dibîne.
(Nîştê Enzan li jorî dibîne, bêyî ku naveroka (**Xwedan**) beravêtî bibe.
Nîştê dibêje: hey firendeyê mezin, bê dest û zinarê min, bê çiya û newalê min, tu giranbuhayî ya firandina te tune ye.
Dîsan **Nîştê** berdewam dike: hey roja ronîwer, bê simbilê genimê min, bê şikeft û warên min, tu giranbuhayî ya tîrêjên te tune ne ....

-7-

- **Tomas Ekwînî**, hozanyarê mezinî xwedêyatîyê, bi rengekî din li van bêtaran dinehêre :
- **Zerdeşt dibêje**: ku vîna jînê bi arîkarîya hêza hişmendîyê, dîrokê pêş dixe û dîrok pêş dikeve.
- **Nîştê dibêje**: ku vîna enzan mîna wazyatîyeke herî helmût mêkanîzma

dîrokê diafirîne.

- **Freud dibêje**: ku **tov (cins)** rêçika dîrokî şîrove dike.
- **Marks dibêje**: ku Aborî têgihiştina mêjûwî berçavî dike.
- **Tomas Ekwînî** dibêje: ku sêyemînîyatîya pîroz (**Bav, Law, û giyanê pîroz**) rê dide Law ku bi roleke pir giring û hêja bilîze.

Law bi xwîna xwe enzan ji gunehê serekî rizgar dike, ji lewra jê re

-8-

Eristo, hozanyarê bilindî **Yûnanî** û hozanyarên **Musilman,** mîna (**îmam Al-Xezalî, Ibin Tufeyl, Farabî**) di gelek waran de dijberî bi ramyarîya **Zerdeşt** kirine, nemaze li ser binçîyê dijberîtîyê . ew dibêjin, ku dijberîtî di mêjûwê de tune ye, pêşveçûna xweberî girêdayîye bi vîn û daxwaza **Xwedan** ve.
Lê ji layê din, **Eristo** li angora hozanyarîya **Zerdeşt** ramiya ye, nemaze derbarî regezê çêbûna **Enzan**, yên li nik Zerdeşt ev in
1- Regezê bedena mirov, ku divê hilweşe û bêkêsim, di dawî de bimîne .
2- Regezê hêza hişmendîyê, ya ku bi vîna enzan ve girêdayî ye û bi regezê sêyem re arîkar e.
3- Regezê giyanî yê semedî .
Eristo dûrî vanher sê wazeyan ne ketîye, ji ber ku, ew jî bawer dike ku **Enzan** ji van regezan e:
1- Bedenekî pelandî berhilweşiya yî, di vê di dawî de tewrê
xwe wenda bike mîna: (**Şînkayetî, Dar, Gul, Pincar... h. d .) .**
1-2- Hêzên dirûnî yên ku di encama dawî de dûrî bedenê pelandî wer nakevin, mîna hêzên jindeweran **(Hesp, Gur, Dîk ... h.d .).**
Hêzên huşmendîyê yên ku tenê bi **Enzan** ve girêdayî ne .

-9-

Di vê rojgara nûjen de gelek ramanvan nêzahîyê li hozanyarîya **Zerdeşt** dikin, mîna: **(Sartir, Garûdî, " berî Musulmantîya wî ", û Herbert Markyoz**) di warê dijberîtîyê de; û (**Seyd Qutub, Mihamed Qutub, Baqir Al-Seder û Al-seyx Nedîm Al-Cisir)** di warê regezên çêbûna enzan de.

---

* Nivîskar û rojnamevanekî Kurdistana rojava ya, li Elmaniya

Ferhengok:

1- Eyîn - to be
2- Binçî - principe
3- Mêjûwî - dîrokî
4- Dijberyatî - contradiction
5- Berbare - mû´adelet
6- Sêyaminîyatî - Al-thalut
7- Rastekîne - mûtleq
8- Pewdan - mustewa
9- Xweberî - naturel

Dr.:Barî

Stara diya Gilgamêş

Li welatê kurdan pîrek hebû aqilbelav dikir,rojekê ji rojan ew nexweş ket,duxtor û hekîm jiher derdoran hatin ser pîrê û hemî rengên dermanan danê ,lê tiştek neguhertin,tenê yekî ji wan hekîman got:

Pîra delal dermanan tiştek ji rewşa te baş nekirin,şîreteke minî dawî heye,ez hêvî dikim tu pêk bînî,dibe ku baş be ji te re.
_ka bêje hekîmo....tu jî ya xwe bêje!
_Ez dibêjim ku tu vî bizrê zarokan rawestînî ,wê hebekî baş be jibo te,birastî min nediye kesî weke te zarok anîne û hevqas temen(emir) kiriye û berê xwe da zarokên pîrê(yên nayên jimartin).
Li gorî hikmeta min girtiye ji jiyanê,ez dibêjim anîna zarokan berdewamiya pîra diya we bû , wê ber bi alozî û nexweşiyê ve dibe û dibe ku ev tişt bibe sebebê ku ew jiyana xwe ji dest bide.Kenekî bilind bi koma zarokan ket ,li hev nerîn û ji xwe re ketin tenazan, ji fediya xwe hekîm ji nav wan derket,pîrê bi kenekî çêkirî(ne jidil)pirsî:

Mesele çiye ?
Çend lawên wê yên eşqî qerebalix,bi hev re gotin:
Dayê ew nizanê tu ji welatê **GILGAMÊŞÎ** tenê te giyayê jiyana sermedî xwariye û tu caran tu namirî.
Pîrê bi xemgînî ji koma zarokên xwe re got:
Ma ewê ji kû zani be evê sira veşartî ku ew çêkir û min û we bawer kir.
Pîrê ji qehra bawerkirinê çavên xwe girtin û li **GILGAMÊŞ** gerîya,gerîya.....gerîya bi çendê salan li rastiya derewa zarokên xwe gerîya.....heta li çolekê westiya,zarokên wê:kesko,soro û zero hatin cemê û her yekî ji wan perçek ji kirasê wê yê xweşik yê kesk û sor û zer birin, kesko kesk bir soro sor bir û zero jî zer bir her yekî ji wan di got:Dayê ezê bi vî rengî gulîstanekê ji te re çêkim,pîrê dimîne tazî ,serme dide wê,nexweş dikeve,bi salan rewşa wê zor dibe,Îzraîylê mirinê tê ser, lê ew dikê û nakê nikarê (stara) xwe veşêre,gotin û xeberan ji zarokên xwe re dide,ku ew çawa tazî hiştin,ji qehra dilê xwe destê xwe li ser (stara) xwe diguvêşe ta xwe birîn dike,bi şewata birînê re pîrê ji xew hildiçine,ku şiyar bû dît ku waye zarokên wê jî wî razayî ne,destê xwe di ser laşê xwe re bir ,dilê wê kete cih,ku kirasê wê yê ji dema **Qazî Mihemed** ve wî lê ye û (stara) wê nuxumandiye,pêre-pêre meleyê barbangê bang da.....û bang da lê yek ji zarwên pîrê ranebû nimêjê û ne yek jî bi xwe hisiye, ji bilî yekî biçûk, piştî demekê ji ramandinê pîrê hêrs da xwe rabû û got:Ya baş ew e ku ez hersê perçê kirasê xwe yên (kesk û sor û zer) bi hev re qenc bidirûm û asê bikim çêtir e ku ev zarokên min kesko,soro û zero her yekî perçekî ji xwe re gulîstanekê çêbike û ez bêfedî herim ber destê xudayê xwe.

Tîpên gir û hûr

Ji bilî mercên li jêr rêzkirî, tîp, di kurmancî de, herdem hûr tên nivîsandin:

1- Nasnav, bi tîpa gir dest pê dikin. Nasnav, navên mirov, bajar, çem, çiya, cih û deveran e. Ev nav tiştekî taybet yan jî, mirovekî didin nasîn û tenê ji bo wî tiştî yan wî mirovî tên bi kar anîn:

Azad	Ez çûm mala Azad
Amed	Bajarê Amedê pir xweş e.
Ferad	Çemê Ferad dirêj e.

2-Her dem hevok bi tîpa gir dest pê dike:
Roja Newrozê ez li bajarê Hewlêrê bûm. Min li kolanê Hogir dît. Wî rojname dikirî.

1- Ku mirov bixwaze ji bo balkêşiyê, peyvekê, di hevokê de, ber çav bike, dikare bi tîpa gir binivîse:
Tiştek ji AZADIYÊ bi rûmetir nîn e.
Qedexekirina zimanê kurdî, ji bo mirovahiyê ŞERMEK mezin e.

2- Sernivîs, bi tîpên gir tên nivîsandin:
RASTNIVÎSA KURDÎ Yan jî Rastnivîsa Kurdî

3- Navên pirtûk, rojname û kovaran:
PÊL (Pêl), QENDÎL (Qendîl), PÊNÛS(Pênûs)

4- Textik, depik û pankertên bangeşiyê dikarin gir bên nivîsandin:
QENDÎL BIXWÎNIN Û BIDIN XWENDIN

<u>Rastnivîsa lêkeran.</u>

1-Di veguhastinê de, pêşgînên demîn û yên nakirinê(di, bi, na, ne) pêşiya lêker digirin û pê ve tên nivîsandin:

Ez diçim welat.	Ez naçim welat.
Ezê biçim welat.	Ezê neçim welat.
Ez neçûm welat.	

Ku lêker cemkirî be, ev pêşgîn pêşiya perçeyê dawî ji lêker digirin. Herweha lêker bi xwe perçe dibe û perçeyên wî cuda dibin ji bilî lêkerên bi pêşpirtikên (ra, ba, ve, hil...) saz dibin:

Veşartin	Ez xwe vedişêrin.	(venaşêrim)
Hilgirtin	Ez vî barî hildigirim.	(hilnagirim)
Razan	Ez pir dereng radizim.	(ranazim)
Sazkirin	Ez hevokan saz dikim.	(saz nakim)
Sorkirin	Ez hêkan sor dikim.	(sor nakim)
Serîhildan	Em ji îro ve, serî hildidin.	
Jihevçûn	Ji hev diçin.	(ji hev naçin)
Bihevketin	Em bi hev dikevin.	(bi hev nakevin)